CIVATA CIWANÊN KOMÛNÎST A KURDISTAN

Çiye Ji Bona Çi Hat Avakirin

CIVATA CIWANÊN KOMÛNÎST A KURDISTAN / CCKK
Çiye Ji Bona Çi Hat Avakirin?

Di sedsala 21an ku em tê de derbaz dibin, di parçebûyîna Kurdistanê û erêşen dagirker û mijokeran li her parçan berdevam e. Pêngavên azadiyê ku li Rojava û Başûr tên avêtin her car astengkirina desthiletdariya mijoker re rûbirû dimîne. Li Bakur û Rojhilatê Kurdistanê desthilatdariya mijoker, bi hovane êrişî xwestekên gelemeyên rewa dike. Dewleta Tirk, çawa neyartiyê li gelê me yê Bakur re dike li gelê me yê Başûr re jî dike. Bi hêceta sosret teskereyên şer derdixe û şerê derveyî sînor dimeşîne. Bi qurtasî dewlata Tirk 100 sale wek pêşengiya dewleta Osmaniya li gorî xwezayiya mijokeriyê tevdigere. Lê belê Kurdistan ne Kurdistana berê ye Kurd jî ne Kurdên berê ne. Pêşveçûna dîrokî ji me re bi daneyên berbiçav dibêje, ev sed sal ya Kurdan e. Sedsala 20an ya têkçûne bû, ya 21an Jî ya serkeftine ye. Tespîta CCKK ya pirsgirêka netewa Kurd ev e; Kurdîstan di pêşîyê da navbera Osmanî û Safaviyan da bû du parçe, paşî di serîya 1900an da bi destên dewletên emperyalîst wek Firansî û Îngilîzan kirin çarparçe.

Em wekî ciwanên Kurdên komûnîstên Bakûr, di têkoşîna gelême yê azadiyê da, ji bona çarenûsa xwe em bi hemû hêzê xwe amedene. Em wek ciwanên Kurdîstan dinav rewşa dewleta qolonyalist da, xebatê xwe yên komûnîst; dinav gelê xwe de bivê hişmendiyê tekoşîna netew dimeşînin. Bilêztirin pêwistiya statûya gelê me derdixe pêş û li ser bingeha xêza me ya bîrdozî em dibêjin li Kurdistanê em jî henên, li Kurdistanê ciwanên komûnîst jî henên!

"Em wek ciwanên Kurdîstan dinav rewşa dewleta qolonyalist da, xebatê xwe yên komûnîst; dinav gelê xwe de bivê hişmendiyê tekoşîna netew dimeşînin. Bilêztirin pêwistiya statûya gelê me derdixe pêş û li ser bingeha xêza me ya bîrdozî em dibêjin li Kurdistanê em jî henên, li Kurdistanê ciwanên komûnîst jî henên!"

Bê gûman di xebatên me yên polîtîk de herdem xala rojev a yekemîn çareserkirina pirsgirêkên netewî û destkeftiyen netewî wê cih bigire. Ber ku di têkoşîna me de him azad kirina netew him jî azad kirina çînî heye. Tevgerînên

ciwanan li gorî nasnameya xwe çînî, pêş xistina polîtîkayên li gorî nasnameya çînî, tene bi mûdexeleya ciwanen komunîst û bi rêxistina tevgere ciwanan gengaz e.

Dive xale de rêxistina CCKK, civata ciwanên xwe şoreşe de wek berpirsiyar dibînin û dixwazin pêşenga şoreşe bikin e. CCKK; rêxistina ciwanên li Kurdistanê ên xwedî nasname ya komûnîst, ên ku dixwazin têkoşîna şoreşê bikin e.

Giraniya gelî Kurdistanê ciwanên, piraniya vê gelî ya bê karin yan jî keda xwe wek salên 1800 an dibin şertên giran de bi meaşên hindik dixebitên. Ciwanen me yên dixwînin jî di bin metirsiya pêşeroje de di demên xwe yî valahî de wekî karker dixebitin. Li ser van rastiyen ku em ciwanên welatê bindestin, em bin zordariya dualî de hatina konaxa raperînê.

LI SER VAN PERSPEKTÎFEN BINGEHÎ

CCKK; wek rêxistina ciwanên Partiya Azadî û Sosyalîzmê hat avakirin. Bi avabûna CCKK re li Kurdistanê di nav refên rêxistinên ciwanan de rêxistinek zêde nabe, bi helwesta ya merksîst-Lenînîst bîrdozî-polîtîk û di çareserkirina azadiya netew de bi helwesta sosyalîst rêxistinek bi bekelorya û cûda ye.

CCKK; xwestekên ciwanên a netewî, demokratîk, akademîk û aborî xwedî derdikeve û diparêze. Lê têkoşîna xwe di sînorên bûrjûvaziya mijoker diyarkirî û di tavîzên mijokeriya ku me neçar hiştî de zîndan nake. CCKK; rêxistinek ên ku dibêjin pergala mijokeriye ra "êdî bese" ye.

CCKK; serfirazên demkî ne, ala xwe ji bona serfirazên mayinde ku serfirazên demkî jî di hundirê xwe de dihewîne bilindike. Pirsgirêk û xwestekên rojane û demrêzî di axêsa pêşxistina têkoşîna şoreşê-de nîqaş dike.

CCKK; Li hember çanda pişavtina bûrjûva ku ciwanan li nirxên netew û çînî dûr dixe, temsîliyeta; komûmal, şoreşger, proleter û nirxên Kurdistanî derdixe pêş.

CCKK; li hember pesandina takeksiyê û mijogeriye ya bûrjûvaziye, şahsetiya civatî û Kurdistanî derdixe pêş. Jibona ciwan welat, netew û çîna xwe nasbike hewldide.

CCKK; pirsgireka netewa Kurd, bi hevgirêdana her çarparçeyan û li welat derxistina dagirkeran de dibine.

CCKK; ji bona li Kurdistanê mijokerî hole rabe, bindestî dawî bibe, bona belavkirina astengen ber azad bûna netewa Kurd; li ser bingeha prensîba antî-mijoker têkoşîne dimeşîne.

CCKK; xwedî têkoşîna Kurdistanê derdikeve û bona pêşketina têkoşîne hewldide. Têkoşîna xwe tene ne bona azadiya netew e. Di ve pêvajoye de pêwîstiya azad bûna keda kedkar, gundî û karkerên jibona azadiya netew têkoşîn dane, diparêze.

CCKK; bi xwesteka hilweşîna desthiletdariya pergala têkiliyên hilberîna kapîtalîste yên ku kedxwar û koletiya xercî li Kurdistanê û cîhane, azad bûna kede; bi xwesteka dawî hatina dagirkerî, komkûjî, rebenî û nezitî ya ku bi biçavbirçîtiya qezencê ya burjuvaziya navnetewî derketiye hole; li gorî bingeha prensîba antî-kapîtalîst û antî-emperyalîst tevdigere û di ve axêse de têkoşîne dimeşîne.

CCKK; banga yekîtî li kes, kom û derdor ên ku dixwazin li Kurdistanê têkoşîna komunîst wek rexistînî bikin e.

CCKK; bîrdoza Marksîs-Lenînîst wek nexşerê ya tevgera xwe dibîne û rêbera hemû têkoşîna xwe ye, di têkoşîna desthilatdariya proleterya de wek ciwanek çînî xwe erkdar û amede dike.